Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :981 | 24-Tîrmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

# 300 parêzer wê ji bo darên Şirnexê bikevin nava tevgerê

**Li herêmên Çiyayê Cûdî û Besta di bin çavdêriya leşkerên Tirk de ev 2 sal in dar tên birîn.**

Di bin çavdêriya leşkeran de 2 sal in li herêmên Çiyayê Cûdî û Bestayê dar tên birîn. Darên ku li herêmên Keniyamîr, Birateto, Birapeşo, Deyndarok, Cinîwer, Belûzer, Rîsor, Serêrû, Tîkera, Qûrteka Pêşya, Girêdeyincê, Şerevan, Xirtikbestê û Navyan ên Bestayê tên birîn bi TIR û kamyonan tên barkirin û vediguhêzin bajarên cuda.

Tevî van dîmenan jî hê ji rêxistinên hawirdorê tu bertek nehatine nîşandin. Hewceyê bibîr xistinê ye ku têkildarî mijarê Baroya Şirnexê ji Greenpeace xwestibû ku bikeve nava liv û tevgerê, lê saziya navborî ji bo qirkirina xwezayê ya li herêmê bersiva "nakeve ber qada me ya pisporiyê" dabû.

Serokê Baroya Şirnexê Rojhat Dîlsîz der barê mijarê de got ku ew şopdarê texrîbkirina xwezayê ne. Dîlsîz da




Komîsyona Hawirdor û Bajêr a Baroya Şirnexê dîmenên TIR û kamyonên daran bar dikin, weşand.

zanîn ku li hemberî qirkirina xwezayê wê bi 300 parêzeran re bikevin nav liv û tevgerê.

***ANF***

# Ji daktîloyên kevin peykerên çûkan

**Peykersaz Jeremy Mayer berî 30 salan daktîloyek parçe parçe kir. Dema daktîlo parçe kir, nizanibû wê ji parçeyên wê peykeran çêke.**



Peykersaz Jeremy Mayer beriya 30 salan daktîloyek parçe parçe kir. Dema wî ev daktîlo parçe kir, nizanibû dê ji van parçeyan peykeran çêke. Wî ji piçûkatiya xwe ve daktîlo nas dikirin û bi dengê daktîloyê mezin bûbû. Mayer nexasim ji daktîloyên kevn pirr hez dikir, ji deng û atmosfera ku dengên daktîloyan di nav xanî de ava dikir, gelekî hez kiriye. Ji lewma, piştî ku wî ev daktîlo parçe kiriye fikreke nû lê peyda bûye û wî dest bi çêkirina van peykerên çûkan kiriye. Wî bi daktîloyan gelek çûkên xweşik û balkêş sêwirandine. Di nav 10 salên dawî de gelek daktîlo kom kirine û bi lehîmê daktîloyên ku parçe kiriye, ji nû ve ango bi sêwirandinên xweşik bi hev ve danîne.

Jeremy Mayer îşaret bi têkiliya insan û makîneyan dike û dibêje; "Bi guherîna teknolojî û civakê re têkliyên me yên bi makîneyan re jî diguherin. Ev daktîloyên ku bi kar tînim, gelek ji wan êdî nayên bikaranîn. Ez dizanim her yek ji wan bi serê xwe xwedî serpêhatiyeke cuda ye. Gelek kesan bi van daktîloyan nivîsand û ev makîne weke heval bûn ji van kesan re. Lê niha ez jî bi çêkirina van peykeran ji xwe dipirsim. Gelo makîne çi ye? Yan jî maneya jiyanê çi ye?

Bi bersiva van pirsan ez jî nizanim, ez bi çêkirina van peykeran li bersiva van pirsan jî digerim. Ez herçiqas bersiva van pirsan nikaribim bidim jî hîs dikim ku di nav vî karî de nêzî bersivan bûme.".

***Ozgûr Polîtîka***

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Arinc | Êş, jan, êşa digere: Arinca piyê min avêtiye ranê min. |
| Astengdar | Kesê ku hin astengiyên wî yên bedenê hene. Nîvişkan, seqet, kor, kerr, lal û hwd. |
| Delîve | Derfet, rê, imkan, firset, mecal... |
| Dirav | Kaxiz, yan jî hesinê çapkirî yên tişt bi wan tên kirîn. Pere. |
| Harmonî (Fransî) | Aheng, lihevhatin, lihevkirin, guncawbûn, xweşlihevkirin: Harmoniya stiranê xweş hatiye ristin. |
| Keval | Tablo, lewhe, tablet, nîgar, wêne, resim, şekil: Li ser kevalên dîrokî xetên balkêş û bedew hebûn. |
| Kolektîf (Fransî) | Karê bi hevkarî û alîkariyê tê kirin. Hevbeşî, pêgarî, zibare... |
| Rêgeh | Ciyê rê tê re derbas dibe. Istiqameta rê. |
| Sotin/sohtin | Şewitîn: Dilê min sot. Me êzingên xwe sotandin. |
| Sotemenî | Tiştên tên şewitandin; weke ardû, êzing, berhemên petrolê û hwd. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | I | ■ | A | ■ | Q | E | R | A | Ş |
| 2 | L | I | C | Ê | ■ | B | A | ■ | E |
| 3 | A | R | ■ | K | L | A | S | Î | K |
| 4 | M | ■ | D | ■ | A | ■ | T | R | ■ |
| 5 | ■ | D | Î | C | L | E | ■ | O | F |
| 6 | B | A | L | E | ■ | Ç | U | ■ | A |
| 7 | Î | N | ■ | J | I | ■ | Z | A | L |
| 8 | ■ | K | E | N | ■ | K | U | L | ■ |
| 9 | D | Î | Z | ■ | | ■ | N | A | N |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | ■ | | | | ■ |
| 2 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 3 | | | | | ■ | | | | |
| 4 | ■ | | ■ | | | | | | ■ |
| 5 | | ■ | | ■ | | ■ | | ■ | |
| 6 | | | | | ■ | | ■ | | |
| 7 | | | ■ | | | | | | |
| 8 | ■ | | | | ■ | | ■ | | |
| 9 | | | | ■ | | | | ■ | |

**ÇEP-RAST**

1. Goştê ku diran tê de çikandî... Teref
2. Sala em tê de ne... Li hin herêman şûna 'dayik'ê tê gotin
3. Kinceke zivistanî ya stûr e û hetanî ser lingan dadikeve... Mehek
4. Cihê ku nan tê de tê pehtin

6. Sureyek Quranê... Pirsek di rewşa ne tewandî de
7. Dewara nêr... Pirtûka wêne ya Manî pêxember
8. Şaşwaz, metel... Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye?
9. Lib... Cêr

**JOR-JÊR**

1. Kur... Axayê binemalê an jî hozê
2. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê... Mektûb
3. Keleşêr... Peyva neyînî... Cureyekî xwînê
4. Cureyekî sebzeyên tuj ku rihayî pir jê hez dikin... Xwîşka bavê mirov
5. Cînavka pirhejmariyê ya xwerû
6. (Memê …) Destaneke me... Çong
7. Boçik, dêl
8. Vê carê... Kurteya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê
9. Agir... Sindoqa ku pê qûm û tiştê wisa tê pîvan

# Zana Kobanê: Yên êrişî me bikin wê berdêlên giran bidin



Ji fermandarên QSD'ê Zana Kobanê got: "Eger dewleta tirkî ya dagîrker êrişeke din ya dagîrkirinê li ser herêmên din yên Sûriyê pêk bîne, emê bersiveke xurt bidin. Yên êrişî me bikin wê berdêlên giran bidin." ***R-3***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 981 | 24-Tîrmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# AMADEKARÎ SERKETIN, XEMSARÎ BINKETIN E

Ji bo girtina destûra êrişa dagîrkeriyeke nû li rojavayê Kurdistanê, berî niha bi çend rojan Erdogan li Îranê bi serokkomarê wî welatî û serokdewletê Rûsaya re ket nava bazarê. Hem derbarê vê bazarê, hem derbarê civîna sêalî û encama wan de Bedran Çiyakur got, mîna civînên Astana ti vîn û biryarên Sûrî di civîna wan de tinebûn. Erdogan jî encama dixwest bi dest nexist, lê di ya xwe de biisrar e. ***R-4***





## Mafê perwerdeya bi Kurdî heq e


Li Tirkiyê 600 hezar mamosteyên dibistan qedandîn û nehatîn tayînkirin hene. ***R-7***





## Li Qamişlo pirsgirêka mazot û benzînê barê welatiyan giran dike

***R-6***



## `Divê cîhan vê neheqiyê qebûl neke`

Welatiyên kantona Girê Spî diyar kirin ku divê gel li hemberî êriş û gefên dewleta tirkî hişyar bin. Herwiha divê gel planên dagîrkîrina xaka Sûriyê, bi têkoşîn û berxwedana xwe têk bibin. ***R-5***



## Jinên Şêxmeqsûd: Bi rêxistin û hevgirtinê emê bi ser bikevin



Jinên taxa Şêxmeqsûd diyar kirin ku jina azad û rêxistinkirî dikare li hemberî dagîrkeriya Tirkiyê û çetetên wê bisekine û bang li pêkhateyên taxê kirin ku bi hevgirtin û rêxistina li gorî stratejiya şerê gel yê şoreşgerî xaka xwe biparêzin. ***R-2***

**Faşîzm di nava tayên mirinê de ye**
Idrîs Henan ***R-4***

**Peymana Lozanê**
Faruk Sakik ***R-5***

**Zirtên paçikî ... Tavên biharê ...**
Dijwar Ehmed Axa ***R-6***

# Jinên Şêxmeqsûd: Bi rêxistin û hevgirtinê emê bi ser bikevin

**Jinên taxa Şêxmeqsûd diyar kirin ku jina azad û rêxistinkirî dikare li hemberî dagîrkeriya Tirkiyê û çetetên wê bisekine û bang li pêkhateyên taxê kirin ku bi hevgirtin û rêxistina li gorî stratejiya şerê gel yê şoreşgerî xaka xwe biparêzin.**

Têgeha şerê gel ê şoreşgerî bûye şerê parastina hebûnê û misogeriya azadiyê. Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li hemberî êriş û gefên derve li gorî şerê gel ê şoreşgerî tev digerin.



### D i parastinê de jin xwedî roleke mezin in

Girêdayî vê mijarê, endama Koordînasyona Kongra Star a taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Nehla Mistefa diyar kir ku berxwedana Şêxmeqsûd bi saya fikrê rêber Ocalan bi ser ket, her wiha destnîşan kir ku bi destpêka kirîza Sûriyê re gel karîbû xwe bi rêxistin bike û li hember hişmendiya desthilatdariyê bisekine.

Nehla Mistefa diyar kir ku di berxwedana Şêxmeqûsdê ya sala 2016'an de, ruxmî êrişên dijwar ên çeteyên dewleta Tirk a dagirker ên li ser taxê, rola jinê di vê berxwdanê de mezin bû, bi taybet di warê rêxistinkirina jinan, amadekirina jêrzemînên ji bo parastina şêniyan, amadekirina xwarinê ji şervanan re û dermankirina birîndaran de.

Nehla Mistefa wiha domand: "Li kêleka rola wê ya di parastina taxê de jî, jinê bi îrade û berxwedana xwe xwe îsbat kir. Me karîbû rolekê di rêxistinkirina civakê de li ser bingeha şerê gel ê şoreşgerî bilîzin ku li dawiyê bi hevgirtina hemû pêkhateyên taxê ji Kurd, Ereb û Xiristiyanan li hember çeteyan bi ser ketin."

Nehla Mistefa destnîşan kir ku keç û xortên taxê ji bo destekdayîna şervanan li eniyên şer bûn û got: "Ew ji bo parastina taxê xwedî rihê berpirsyariyê bûn, bi dehan ciwan di oxira parastina taxê de şehîd bûn û li dawiyê em bi ser ketin."

### 'Divê hevgirtina gel û piştgiriya hêzên leşkerî xurtir bibe'

Endama Komîteya Perwerdeyê ya Kongra Star Muna Mihemed destnîşan kir ku berxwedana Şêxmeqsûd bi pêşengtiya jina azad bi ser ket û got: "Jinê karîbû li hember êrişan, bi fikrê rêber Ocalan xwe biparêze û roleke wê ya mezin di perwerdekirina gel li hember dagirkeriya Tirk de hebû."





Muna Mihemed girîngiya rêxistina jinan di koman de anî ziman û got, komek madeyên girîng peyda bike û bigihêne taxê, komeke din jî birîndaran derman bike û yeke din jî stargehan ji şêniyan re amade bike.

Girêdayî rola jinê ya di rûrbirûbûna bi êrişên dagirkeriya Tirk re Muna Mihemed destnîşan kir ku jin dikare çekê rake û civakê bi rê ve bibe, gava jin li kêleka hêzên xwe disekine bêguman ew bi ser dikeve.

Muna Mihemed wiha domand: "Şêniyên herêmê bi mêr û jinên xwe amade ne li hember êrişên dagirkeriya Tirk bisekinin. Eger em ne amade bin dê xaka me dagir bikin û me koçber bikin, ji ber wê jî divê em hevgirtinê û piştgiriya ji hêzên xwe re xurtir bikin."

Di dawiya axaftina xwe de Muna Mihemeda diyar kir ku tecrubeya berxwedana Şêxmeqsûdê ya li ser bingeha şerê gel ê şoreşgerî ku bû nimûneya berxwedanî û rêxistinê û hevgirtina civakê ji cîhanê re û teqez kir ku gelê rêxistinkirî dikare azadî û serkeftinê pêk bîne.

***ANHA***

# Li dijî asîmîlasyonê Inîsiyatîfa jinan

**"Koma Jinên KAYY-DER'ê stiranên gelêrî yên ku me berê li nav dehl, rez, mêrg û çîmenan digotin, dibêje. Em stiranên ku dayîkên me berê gotine, dibêjin. Cilûbergên me yên di çalakiyên me de jî cilûbergên Kurdî ne û her kes cilûbergên herêma xwe li xwe dike. Ev ji bo me bingeh e."**

Ligel asîmîlasyon, qedexe û



zextên ku dewleta Tirk qederê sed salan li ser zimanê Kurdî didomîne jî ziman û çanda Kurdî hene. Komeleya Alîkariya Civakî, Pêşketin û Çandê ya navçeyên Gêxî, Dep, Azapert, Xolxol û Çêrme (KAYY-DER) ya ku beriya bi 31 salan li Stenbolê ji bo parastina çanda Kurdî hat avakirin, xebatên xwe bê navber didomîne.

Koma Jinên KAYY-DER'ê, di bin banê komeleyê de hatiye damezirandin. Ev 11 sal in ew li dijî asîmîlasyonê bi zimanê Kurdî ku zimanê wan ê zikmakî ye, distirê û derdikeve ser dikê. Bi vî awayî 11 sal in hunermendên jin bi cilûbergên xwe yên neteweyî û zimanê dayikê hunerê xwe bi pêş dixin. Endama Komê Zeynep Kuloglu, diyar dike ku ew deyndarên wan kesan in ku ji bo Kurdî berdêl dane û bang li her kesî kir da ku bi zimanê xwe yê dayikê biaxive.

### 'KAYY-DER stûna herêm û çanda me ye'

Zeynep Kuloglu anî ziman ku ji bo Kurdên di salên 90'î de hêzên dewleta Tirk ew gundan derxistine û hatin koçberkirine, ziman û çanda xwe biparêzin, KAYY-DER hatiye avakirin: "Ders û perwerdeya bi Kurdî li vir heye. Dersên Erbane, saz, govenda folklorîk tên dayîn. Koma me ya jinan heye. Li KAYY-DER'ê xebatên cûr bi cûr tên kirin. Ji bo me pirr girîng e ku em werin cem hev û bi rehetî bi zimanê xwe yê dayikê biaxivin, li wir hev du bibînin, êşên xwe parve bikin. KAYY-DER stûna me ye, parêzvana herêm û çanda me ye."

### 'Em stranên dayîkên xwe dibêjin'

Zeynep kuloglu ya ku rêvebera KAYY-DER'ê bû, piştî ku jinên ku berê di nava Koma Jinên KAYY-DER'ê de bûn, ji komê derketin ji bo komê li ser piyan bihêle, tevlî komê bû: "Koma Jinên KAYY-DER ev 11 sal in heye. Hevalên me pirr baş bûn. Niha veguherîn çêbûye û komeke nû ava bûye. Koma Jinên KAYY-DER'ê stranên gelerî yên ku me berê li nav dehl, rez, mêrg û çîmenan digotin, dibêje. Em stranên ku dayikên me berê gotine, dibêjin. Cilûbergên me yên di çalakiyên me de jî cilûbergên Kurdî ne û her kes cilûbergên herêma xwe li xwe dike. Ev ji bo me bingeh e. Em her tim giringiyê didin koma jinan û em ê bidinê jî. Em bi vê serbilind in. Armanca me ew e ku em çand û stranên xwe yên gelêrî bistirên. Her çiqas mirov diguherin jî rêya me her tim yek e"

### Xeyala me pêk hat

Zeynep anî ziman ku Koma Jinên KAYY-DER´ê ji 7 jinan pêk tê û diyar kir ku armanca wan ew e ku xwedî li keda jinê ya ku di nava malbatê de nayê dîtin, derkevin û ji ber vê yekê jî hewl didin roj bi roj hejmara xwe zêde bikin: "Me qet xeyal nedikir ku em weke jin derkevin ser dikê. Lê niha xeyala me pêk hatiye û em li ser dikê stranên Kurdî dibêjin. Ev yek baweriya jinan bi xwe zêde dike. Gelek hevalên me dibêjin, 'Em jî beşdar bibin, em dixwazin stranekê bibêjin'. Gavên piçûk ên jinan wê mezin bibin. Jin xwediyê çand û zimanê dayikê ne.

### 'Xwedîderketina li ziman deynê me ye'

Zeynep got, bi stranên bi zimanê dayikê û cilûbergên xwe yên neteweyî serbilind e. Zeynep destnîşan kir ku li ser dikê ew bi cewhera xwe re dibin yek û xwedîderketina li zimanê dayikê "deynê" wê ye: "Dema ku bi cilûbergên xwe yên neteweyî derdikevim ser dikê û xwedî li çanda xwe dertêm, hesteke cûda dide min." Herwiha

Zeynep da xuyakirin ku li dijî ziman û çanda Kurdan bi awayekî sîstematîk êriş hene û got, "Em deyndarê zarokên xwe ne û em ji siberojê berpirsiyar in. Divê em



mîrasa ji me re maye, vejînin. Yan jî em ê winda bibin. Armanca wan tenê ew e ku me tine bikin, me wek netewe nehesibînin. Em naxwazin winda bibin. Em hene û em ê çanda xwe dewam bikin. Me berdêlên giran dan. Em li ber xwe didin û heta em bigihêjin mafên xwe em ê vê têkoşîna xwe bidomînin. Em deyndarê wan kesan in ku ji bo Kurdî û çanda Kurd berdêl dane û em mecbûr in."

### 'Axaftina bi Kurdî ya herî xerab ji Tirkî çêtir e'

Zeynep bang li her kesî kir da ku zimanê xwe yê dayikê biparêzin û jin jî tevlî Koma Jinên KAYY-DER'ê bibin:

"Divê ti kes ji bo ku xwe îsbat bike, ji cewherê xwe dernekeve. Heger her kes karibe çanda xwe û zimanê xwe yê dayikê zindî bihêle, ev dê baş be. Axaftina bi zimanê dayikê bi awayekî herî xerab jî ji axaftina bi Tirkî bi qîmettir e."

***JINNEWS***



# Mafê perwerdeya bi Kurdî heq e

## Li Tirkiyê 600 hezar mamosteyên dibistan qedandîn û nehatîn tayînkirin hene.

Li Tirkiyeyê 600 hezar mamosteyên ku mezûn bûne û nehatine tayînkirin hene. Li gorî daneyên Dîwana Muhasebatê di saziyên perwerdehiyê de 120 hezar mamoste kêm in. Wezîrê Perwerdeya Neteweyî Mahmût Ozer jî ragihand ku di Îlonê de di 99 waran de ew ê 20 hezar mamosteyan tayîn bikin. Ji van 20 hezar mamosteyan 3 ji dersa hilbijartî ya Kurdî re hatine veqetandin.

Serokê Şaxê Wanê yê Sendîkaya Kedkarên Perwerdehî û Zanistê (Egîtîm-Sen) Mûrat Atabay, eb yek wekî "heqareta li Kurdan" nirxand û got, ew li şûna dersên hilbijartî mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî diparêzin.

Atabay bi bîr xist ku ew ji berê vê doza perwerdehiya bi zimanê dayikê dikin.

### 'Dersa hilbijartî heqaret e'

Atabay ji bo dersa hilbijartî hî got, "Li Tirkiyeyê nêzî 30 mîlyon Kurdî hene, lê Kurd nikarin qursekê jî vekin. Hemû saziyên ku li ser zimanê Kurdî dixebitin, bi Biryarnameyên di Hukmê Qanûnê de (KHK) tên girtin. Mafê Kurdan heye ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibin û perwerde bikin. Dersa hilbijartî heqaret e. Em mafê perwerdeya bi zimanê dayikê diparêzin."

### Bi hincetan Kurdî asteng dikin

Atabay, da zanîn ku her sal nêzî 200 xwendekar ji beşên Kurdî yên zanîngehan mezûn dibin û got, "Hûn tayinkirina mamosteyên Kurdî tenê ji bo xapandinê bikin jî, dîsa hûn mecbûr in ên mezûn bûne tayîn bikin. Heger hûn li hemberî hejmara mezûnan 3 kadroyan wezîfedar bikin, a rast hûn bi vê yekê nêzîkatiya xwe bi zelalî nîşan didin. Ev yek tê maneya 'Ji bo dersa hilbijartî neyê hilbijartin, em her tiştî dikin'. Dîsa di saziyên perwerdehiyê de rêgezek cidî heye




ku xwendekar dersên hilbijartî yên Kurdî hilnebijêrin. Li gel vê, dema ku xwendekar Kurdî hildibijêre, bi gotina 'mamosteyên me tine ne' sinifêa dersa Kurdî venakin."

***MA/WAN***

# Dîrok li mala xwe vegeriya

**49 keval û tuxleyên dîrokî yên li Bokanê hatîn dîtin, ji mûzeya Tehranê niha li mûzeya Bokanê hatin vegerandin. Şanoger û hunermendê Kurd Qutbettîn Sadiqî ji bo vê dibêje, ev berhemên ji dîroka me mane, parçeyekî girîng yê nasnameya gelê Kurd in. Divê em nasnameya xwe ji bîr nekin.**

Beriya şoreşa Îslamî ya Îranê dest pê bike, li gelek bajarên Îranê bi destên arkeologên biyanî gelek berhemên dîrokî ji bin erdê hatibûn derxistin. Wan salan, li hin bajarên Rojhilatê Kurdistanê jî xebatên kolanên erdê bi rê ve çûbûn. Bajarê Bokanê yê li Rojhilatê Kurdistanê yek ji van bajaran bû ku lê gelek lêkolîn û kolanên arkeolojîk û dîrokî hatibûn kirin. Derbarê dîroka Kurdan û şaristaniyên kevn de gelek berhem hatibûn dîtin. Sala 1977'an bi pêşengiya profesorê Elman, Wolfram Kleiss û arkeologê Kurd Îsmaîl Yexmayî qederê 200 heb berhemên dîrokî yên şaristaniya Axamenîş, Manai û Mazdek ji bin erdê hatibûn derxistin. Lê gelek ji van berheman ji hêla dewletên biyanî ve hatin dizîn û yên nehatin dizîn jî ji bajarên



Rojhilatê Kurdistanê revandin muzeya Tehranê.

Piştî hin lêkolîn û şopandinên dewleta Îranê, derket holê ku ev berhemên dîrokî li Japonya û Swîsreyê ne.

Nexasim jî 49 berhemên dîrokî yên ku li Bokanê hatibûn dîtin, Swîsreyê ew desteser kiribûn. A rastî beriya dewleta Swîsreyê van berheman desteser bike, malbateke Îranî gelek ji van berheman li cem xwe digirtin û sala 2012'an dixwest wan bifiroşe. Lê dema dewleta Îranê bi vê yekê hesiya, demildest bi dewleta Swîsreyê re kete nav têkiliyan û pêşî li vê yekê girt. Dewleta Îranê piştî hin xebatên dîplomasiyê yên di vî warî de sala 2021'ê hemû berhemên dîrokî ji dewleta Swîsreyê wergirtin û ew birin li muzeya Tehranê bi cih kirin. Ev demeke dirêj bû ku ev 49 berhemên dîrokî yên ku li Bokanê hatibûn dîtin û aîdê wê erdnîgariyê bûn û ji şaristaniyên Kurdan mabûn, li muzeyê diman.

Di nava wan de tuxleyên rengîn jî hene yên ku li ser wan resmên heywanan hene. Dewleta Îranê gotibû ku ew di nav hewldanekê de ye ku li Bokanê muzexaneyekê vekin û piştî ev muzaxene vebe, ew ê van berheman li muzeya Bokanê vegerînin û dê berhem li wir bimînin. Herî dawî di nava vê mehê de (Tîrmeha 2022'an) muzeya Bokanê temam bû û niha ev berhemên dîrokî li wir tên nîşandan.

### Li mûzeya Bokanê tên nîşandan

Li gorî arkeolog û zanyaran, kevnariya van berheman 2800 sal e. Ev 49 keval û tuxleyên rengîn ango resm li ser wan hene, li girê Qeleyçî yê li Bokanê hatibûn dîtin. Berê jî gelek alav û kevalên ku hîna jî mirov bi sir û raza wan baş nizanin, hatibûn dîtin.

Lê ev kevalên bi resm û xweşik yên ku niha li muzeya Bokanê tên nîşandan, tê gotin ku yên şaristaniya Manaî ne û ji wê demê mane. Ji xwe bajarê bi navê "Zirto" an jî "Izirto" ku li Qeleyçî ye, peytexta şaristaniya Manaiyan bû. Li gorî agahiyên arkeologan, li vê herêmê bi qasî 400 keval û tuxleyên rengîn hatine dîtin û ku ew jî sembolên vê şaristaniyê bûne. Lê niha tenê 98 berhemên dîrokî yên tescîlkirî li muzeya Bokanê tên nîşandan. Li ser van kevalên ku hatine dîtin, nexasim fîgûrên şêran yên ku serê însanan bi wan ve ye û yê bizinan heye. Gelek ji wan bi perr û bask hatine teswîrkirin.

### Efsaneyên me ne

Di dema vekirina muzeya Bokanê de şanoger û hunermendê Kurd Qutbettîn Sadiqî jî hazir bû û wî jî derbarê van berhemên dîrokî yên ku ji Kurdistanê hatibûn dizîn, got; "Ev berhemên ji rabihuriyê mane parçeyekî girîng ê nasnameya gelê Kurd e. Divê em nasnameya xwe ji bîr nekin, di van berhemên dîrokî de gelek derbirînên veşartî hene. Di gelek berhemên hunerî de ev rastî heye û ev kevalên rengîn jî behsa vê rastiyê dikin. Divê em van derbirînên rabihuriyê yên veşartî, kifş bikin, li welatê me ji van keval û tuxleyan gelek hene û ev berhem efsaneyên me ne."

### 'Mûzîk, mîmarî û rêûresmên me nîşan didin'

Qutbettîn Sadiqî herî dawî bi bîr xist ku ev berhemên dîrokî, dikarin valahiyên dîrokê dagirin û bikin ku em bi roja îro re têkiliyên baştir ava bikin û wiha dawî li axaftina xwe anî, "Li ser van keval û tuxleyan muzîk, mîmarî, rêûresm û çanda me heye. Sir û hebûna me ya li vê jiyanê jî ew e ku em bi van têkiliyên winda dakevin û maneyê bidin dîrok û çanda xwe."


Welatiyê bi navê Zanyar Muhamedînko li Bokanê mamoste ye. Me bi riya telefonê xwe gihande wî. Wî jî kêfxweşiya xwe ya ji bo van berheman anî ziman û got, em dixwazin berhemên dîrokî yên ku ji Kurdistanê dûr ketine, li welatê xwe vegerin û li muzeyên bajarên Kurdan werin nîşandan da ku xelk hay ji dîroka xwe hebin û bi vî awayî li siberoja xwe xwedî derkevin.

***Ozgûr Polîtîka***

# Jin û ajelên dirinde bi hev re

**Dimitra Milan bi şêwaza xwe ya serbest ya li ser tuwalê û sembolîzma xwe, balê dikişîne ser têkiliya navbera jin û hewyanan de.**

Dimitra Milan bi şêwaza xwe ya serbest a li ser tuwalê û sembolîzma xwe, balê dibe ser têkiliya di navbera jin û hewyanan de. Wê di 5 saliya xwe de dest bi



wênesaziyê kiriye û gava bûye 14 salî pêşangeha xwe ya ewil vekiriye.

Di vî warî de keçikeke şareza ye û karên serketî dike. Wê ji piçûkatî ve nexasim heywanên dirinde yên razber xêz kirine. Şêr, piling, gur û rovî çend ajalên sereke ne di tabloyên wê de. Jixwe, ew jî dibêje, "Ez bi çi awayî dest pê bikim jî di dawiye de dibînim ku min ajal û jinek bi hev re xêz kirine."

Dema Dimitra Milan resmekî xêz dike, ew jî nizane dê encameke çawa wê derkeve holê û li ser têgehan nasekine.

Ew vê rewşê jî wiha rave dike, "Ez ji bo têgehekê ava bikim yan jî xêz bikim, dest bi wêneyekî nakim ti carî. Piştî diqedînim, ez jî li ser difikirim hinekî û dixwazim bi mane bikim. Lê çi bikim jî di nav her tabloya min de fîgura 'gur' derdikeve pêş. Ew ji bo min hêja û bi mane ne û dikarim bi gelek hûrgiliyên wan dakevim da ku wan xweşik sembolîze bikim."

Tabloyên Dimitri Milan ji rastiyê dûr in û ew bi şêwaza surrealîst tabloyên jin û ajalan çêdike. Ew dibêje, destpêkê wê hinek zehmetî kişandiye, lê piştî ku hin tişt xistine serê xwe û li ser wan fikiriye, wê zehmetî nekişandiye û niha xwe ji bo vî karî pirr bi hêz dibîne.

***Ozgûr Polîtîka***

# Li Qamişlo pirsgirêka mazot û benzînê barê welatiyan giran dike

**Di dema dawî de li bajarê Qamişlo pirsgirêka sotemeniyê bûye mijareke pir girîng. Ji bo ku welatî çend lître mazot û benzînê bi dest bixin pêwîst e bi saetan li benzînxaneyan bisekinin. Derbarê vê rewşê de rêveberê Ofîsa Sotemeniyê ya bajarê Qamişlo Helîm Iko da zanîn ku rewşê dişopînin û wê çareserî di demekê nêz de were dîtin.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Derbarê krîza sotemeniyê ya li bajarê Qamişlo de ku piraniya welatiyan rastî wê tên û bandora wê li civakê bi giştî dike, rêveberê Ofîsa Sotemeniyê û welatiyên bajêr ji me re axivîn û nêrînên xwe anîn ziman. Herwiha welatiyan diyar kir ku neçar in bi saetan li ber benzînxaneyê rawestin, da ku mazot yan benzîna otombîlên xwe bistînin.



**`Ev krîz bandorê li karê me dike`**

Welatiyê bi navê Samir Ebdullah Elî ku li ser taksiyê kar dike, behsa êş û azarên xwe yên ji ber peydekirina miqdareke benzînê kir û wiha got: "Em bi saetan li ber benzînxaneyê disekinin, da ku em çend litre benzînê bi dest bixin. Ev yek bandorê li karê me dike û em nikarin baş kar bikin. Çimkî roja ku pêwîstiya min bi benzînê hebe, ez wê rojê tevê bi peydekirina wê û sena li ber dorê diqedînim. Herwiha got, her carê nêzîkî 23 lître benzîn digirim ev miqdar têra rojekê yan du rojan dike. Herwiha ji bo xebata li derveyî bajêr ev mîqdar hindik e û dihêle ku em benzînê ji hin deverên cuda û bi bihayekî pir giran bikirin. Ji ber wê jî piraniya caran em sûdê ji karê xwe nagirin."

Samir bîr xist ku nêzî hefteyekê ye rêveberiya sotemeniyê kartên ji bo peydekirina mazot û benzînê ji wan re hilbjartine û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Rêveberiyê ev kart hilbijart da ku krîz kêm bibe. Mixabin heftiyek e em wan bi kar tînin jî, lê hê kirîz weke berê ye û ti çareserî nehatine dîtin."

Samir Ebdullah Elî di dawiyê de hêvî kir ku krîz bi dawî bibe û sotemenî peyda bibe. Heriwha got, piraniya şofêrên taksiyan û civak bi giştî jî zehmetiyan ji ber kêmbûna sotemeniyê dikşînin.



**`Heta ku ez benzînê peyda dikim pir diwestim`**

Welatiyê bi navê Mihemed Hec Îbrahîm jî yê 72 salî, ku ji bo debara malbata xwe bike li ser otomobîleke piçûk kar dike wiha axivî: "Ev otombîl çavkaniya karê min e, lê ji ber krîza sotemeniyê ez êşê di peydekirina benzîna erebeya xwe de dikişînim. Heta ku ez benzîna xwe peyda dikim pir diwestim, çimkî bi saetan li bendê dimînim."

Mihemed Hec Îbrahîm bal kişand ser bikaranîna benzîna serbest û wiha pê da çû: "Ji ber bihabûna benzîna serbest em nikarin bikirin û bi kar bînin. Bihayê benzînê li stazyonên benzînxanryê li gorî rewşa aboriya me pir baş e. Lê bihayê benzîna serbest ji bo me pir giran e. Çimkî lîtreya benzîna serbest bi 1500 lîreyên sûrî ye. Em hêvîdar in ku berpirsên sotemeniyê çareseriyekê ji vê krîzê re bibînin. Lewra ev bûye aloziyeke mezin û her kes zehmetiyan pê re dikşîne."



Ji bo ku em hê zêdetir li ser sedemên kirîza sotemeniyê ya



ku di dema dawî de girantir bûye nas bikin, rêveberê sotemeniya Qamişlo Halîm Iko ji me re axivî û diyar kir ku ji ber ku li du stasyonan tenê mazot û benzîn dihat belavkirin krîz derdiket. Ji bo kêmkirina kirîzê di dema dawî de me stasyonên belavkirinê zêde kirin û niha li çar stasyonan sotemenî tê belavkirin.

Helîm behsa sedema derketina krîza sotemeniyê kir û wiha dirêîjî da axaftina xwe: "Yek ji sedemên krîza sotemeniyê ya li bajarê Qamişlo ew e ku hin welatî di heman rojê de piştî ku mazot yan benzîna xwe bi dest dixistin ji bo cara duduyan sotemeniyê peyda bikin, vedigeriyan ser dorê û tevlîhevî çêdibû. Herwiha ji bo çareseriyek ji vê diyardeyê re were dîtin, me kart hilbijartin û dane welatiyan da ku tev bi awayekî adil sotemeniyê bigirin. Heriwha got, tevayiya şofêrên otomobîlan bi kartên ku ji wan re hatine dayîn wê pêwîstiya xwe pêk bînin."

Helîm Iko diyar kir ku jimara otombîlan li herêmê bi awayekî berbiçav zêde bûye û miqdarê şotemeniyê yê ku digihe me têra tevan nake. Ji ber wê jî krîz derdikeve holê. Ji bilî otombîlan jî hebûna jenerator, taqîgeh û kargehan bandora krîzê zêdetir dike.

**`Wê çareserî di demeke nêz de were dîtin`**

Rêveberê ofîsa Sotemeniyê ya bajarê Qamişlo Halîm Iko di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Em ji bo çareserkirina vê krîzê dixebitin. Em rewşê dişopînin û wê çareserî di demekê nêz de were dîtin

## Ciwanên Kobanê navên xwe ji bo kursên destwerdana lezgîn qeyd dikin

**Di çarçoveya amadekariya welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê de yên ji bo parastina herêmên xwe li hemberî êrişên dewleta Tirkan, bi dehan ciwan beşdarî dewreya perwerdeyê ya destwerdana lezgîn bûn.**

Di destpêka meha Tîrmehê de, Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bang li welatiyan kir ku tev li kursên hemşîretî û destwerdana lezgîn bibin.

Banga Desteya Tenduristiyê piştî ku rewşa awarte 6'ê Tîrmehê de hate ragihandin, hatibû kirin. Rêveberiya Xweser ji bo amadekariyên rûbirûbûna êrişên berfireh ên dewleta Tirk ên li ser herêmê, rewşa awarte ragihandibû.

Li ser banga Desteya Tenduristiyê ya ji bo hemû navendên tenduristiyê yên perwerdekirina destwerdana lezgîn, rêveberiya Nexweşxaneya Emel li ser hesabê xwe yê Facebookê destpêkirina kurseke destwerdana lezgîn ragihand.

Rêveberiya Nexweşxaneya El-Heyat a navçeya Sirîn a kantona Kobanê jî li ser banga Desteya Tenduristiyê vekirina dewreyeke perwerdeyê ya destwerdana lezgîn ragihand.


Di vê çarçoveyê de ji rêveberên Nexweşxaneya Emel a Kobanê Cemal Bekir got: "Tevî ku roja yekem a tomarkirinê ye, lê dax-



wazeke mezin ji ciwanan heye ku beşdarî vê dewreyê bibin. Ji saetên sibehê ve nêzî 10 kesan ji bo ku tev li kursê bibin navê xwe tomar kir."

**ANHA**

### Tîr



**Zirtên paçikî … Tavên biharê …**

**Dijwar Ehmed Axa**

Di gelek çîrokên Kurdan de, her tim li kêleka ?êr ango (qiral) rovî wek (?êwirmend) derbas dibe. Karê wî qe?merî ye... Qa?o ?êwirmendê qiral e. Di rastya jiyanê de jî wisa ye, li kêleka hêzên mezin mîna Amêrîka, Rûsya qe?merên weke Erdoxan hene.

Pi?tî ?erê serxwebûnê li Tirkiyê di navbera salên 1919 û 1923'yan de ku Mustafa Kemal bi alîkariya Kurdan (Kongreya Erizrom, Sêwas 1919) ?erê Ermen, Yûnan, Ingilîz, Fransizan, kir û Komara Tirkiyê ava kir. Pi?tî ku herêmên dagîrkirî rizgar kirin (li rojhilat Serhed, Ba?ûr "Adana, Ûrfa, Dîlok, Riha" li rojava jî Stenbol).

Demek derbas bû lê hê Îtalya digort "Anatolya" ya me ye. Li hemberî wê Tirkan digot, Kemal pa?a gotiye, binêrin ezê dîsa cezmê bixim lingê xwe haa! Ango wê Kemal pa?a careke din cilûbergên le?kerî li xwe bike û ?er bike. Bi wê artê?a piçûk û bêçek. Ji aliyê din ve neq?eya Îtalya wek cezmê ye. Ango wê Atatûrk Îtalya biperçiqîne û pê lê bike. Ew bixwe Zirt bûn, zirtên pûç û vala. Lewra wê demê ne artê? bûbû artê?, ne çekên wan hebûn. Lê her zirtên xwe dikirin.

De ka em bên ser Erdogan û niha. Zirtên wî ne li ser Îtalya ne, li ser Kurdistanê ne. Kir, nekir nikarî vîna Rêber Apo û berxwedan wî li Îmralî bi?kîne. Ji ber wê berê xwe da Qendîl û dest bi zirtên xwe kir. Ev nêzî 40 salî ye her car wê bêjin me Kurd qelandin, me armancên opersyona xwe bi cih anîn û me "terorîst" tine kirin. Lê careke din wê bên û êrî? bikin! De werin safî bikin. Dema we fîkandin Kurdan qedexe dikir û we digot nabe hûn bi Kurdî bifîkînin, we nikarîbû me tine bikin. Îcar niha pi?tî ku em bûne hêz û xwedîtecrûbe, xwedîîrade, xwedîbawerî, xwedserok û xwedîrêber hûnê çawa me tine bikin heyra?

Dev ji van zirtên xwe berdin. Eger ne ji Kurdan bûya nebûn. Ti nema xelkê bi serê we neanî. Hûn jî gurên me ne. Lê ne sûcê we ye, sûc û gunehê mezin yê me bixwe ye, me xwe kir kole ji we re û me xulamtiya we kir. Heyf û mixabin. Li bajarê me dostekî me hebû. Birayê wî bijî?k bû. Dema di navbera wî û xelkê pevçûn çêdibû, xeber ji wan re didan. Lê birayê xwe bi diya wan re digot. Me jê re digot kuro tu çima tu behsa xwe nakî? Rastya rew?a me jî niha wilo ye. Ji aliyekî ve Erdogan zirtê xwe dide û weke taviyên biharê ewr giran dibe, tarî dibe, mirov dibêje wê ?ape rabe. Lê dawî dibîne ku tavî ferikî û berbû hetikîn. Ne berf, ne baran. Ji aliyê din ve dema lê teng bibe çi jê bê wê bike. Bi taybetî dema destvala ji hevdîtinên xwe vedigere. Ji ber wê me tev dîtin. Encama civîna Tehranê ya berî çend rojan di nevbera wî û serokê Rûsya Pûtîn û yê Îranê Reîsî de, çawa komkujya Zaxo çêbû.

Zêdeyî sê mehan e ku zirtên xwe dike û dibêje ezê Herêmên Parastinê yên Medya bixim destê xwe û çekên heyîn hemû bi kar anîn. Lê ti encam negirt. Ji ber wê ?kestinê li Zaxo êri?î sivîlan kir. Pi?t re dibêje ev karê terorê ye... de werin li vê ecêbê...Cihên HPG'ê bi dehên km dûrî Zaxo ne û kesên bûyîn qurban piranî zarok û jinên Ereb in. Eger piçek aqil di serê te de mabe Erdogan tuyê rast berê xwe bidî Îmralî, çareserî li wir e…



# Cîhan Xelîl: Gel xwe ji rewşa awarte re amade dike

**Şêwirmenda Rêveberiya Xweser ya Demokratîk Cîhan Xelîl diyar kir ku gelê bakur û rojhilatê Sûriyeyê bi dirûşma 'emê xaka xwe biparêzin' bi awayekî aktîf tevlî seferberiyê dibe.**

Şêwirmenda Rêveberiya Xweser a Demokratîk Cîhan Xelîl têkildarî Rewşa Awarte û helwestên gel a li Rojava hatiye îlankirin ji ANF'ê re axivî.

Xelîl bal kişand ser gef û amadekariyên dewleta Tirk a dagiker û got: "Til Rifat, Minbic û Kobanê hedef tê nîşandan. Gefên tehdîdê cidî digirin dest. Tûrên dîplomatîk ên dewleta Tirk a ji bo êrîşê dewam dike. 19'ê Tîrmehê çû Tehranê hevdîtin kir."

Xelîl destnîşan kir ku ev yek li ber çav hate girtin û Rewşa Awarte hate îlankirin û bibîr xist ku ji ber dagirkerî û gefên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ji xwe di nava mercên rewşa awarte de bûn û ev anî



ziman: "QSD, YPG û YPJ di warê leşkerî de tedbîrên xwe digirin. Wek gel jî amadekarî hatine kirin. Rêveberiy Xweser plan û projeyên xwe yên 2022'an da sekinandin û kete pozîsyona şer. Zêdetir kar li ser depokirina derman, erzax û mercên şer kar tê kirin. Ji bo vê Rewşa Awerte di nava vê yekê de ye."

Xelîl da xuyakirin ku bi îlankirina Rewşa Awar te re hestyariya gel zêdetir bû wiha domand: "Gel diyar dikin ku li kûderê bin em ê li mala xwe û welatê xwe tedbîrên xwe bigirin, ketine nava liv û tevgerê. Gel dibêjin; 'Em ê li mal û cihê xwe bi hêzên leşkerî re têkoşîn bikin'. Gel tunelan çêdike û ezraq kom dike. Di ferq rewşê de ne, hemû amadekarî tê kirin. Em ê bi hêza gel û biryardariyê bigihêjin armancên xwe."

***ANF***

## Kongreya Star: Divê helwesta li hemberî dewleta tirkî zelal be û baregehên wê werin girtin

**Piştî komkujiya dewleta tirkî ya dagîrker li Zaxo kirî, Kongreya Star daxuyaniyeke nivîskî weşand û got, divê hikumeta Iraqê û ya başûrê Kurdistanê li hemberî dewleta tirkî helwesta xwe zelal bikin.**

Kongreya Star bi daxuyaniyekê komkujiya dewleta tirkî ya dagîrker li Zaxo pêk anî şermezar kir û banga helwesteke cidî li hikumeta Iraqê kir.

Di daxuyaniya Kongra Star de ev xal hatin diyarkirin:

"Ji destpêka şoreşa Rojavayê Kurdistanê û heta niha jî dewleta Tirkan êrişên xwe li ser gelên herêmê bê navber dewam dike û di 10 saliya Şoreşa 19'ê Tîrmehê de ji bo binpêkirin û têkbirina hemû deskeftiyan bi hemû awayan ked dide ku bingeha vê projê ji holê rake.

Êrişên dewleta Tirk ên ku çêdibin bi hincetên cuda ne û herêmên me di nava metirsiyan de dihêlin. Ev êriş ne tenê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye, lê belê li ser Şengal, Mexmûr û Herêmên Parastinê yên Medyayê jî tê kirin bi wê re dixwaze herêmê vala bike."

Di berdewama daxuyaniyê de ev hate destnîşankirin, "Di 20'ê Tîrmehê de jî dewleta Tirk a dagirker bi topan êrişî cihekî geştiyariyê kir ku gelê Iraqê li wê derê çûbûn seyranê di encama wê de 9 kes hatin qetilkirin, 2 zarok û 3 jin û 4 mêr her wiha 25 birîndar hene û birînên wan giran in. Di heman demê de salvegera komkujiya Sûrojê bû. Destpêkê em vê dibêjin; çima ezman û hewaya Iraqê ji dewleta Tirk re vekirî ye? Ji ber ev êriş piştî ku dron derketine çêbûye. Her wiha xwe bicihkirina dewleta Tirk di Iraqê de bi vî awayî gelo nayê wateya dagirkeriyeke rewa? Ji ber li ber çavan e û her kes mûdaxeleya dewleta Tirk ji hemû erd û hewaya dewleta Iraqê û herêma Başûrê Kurdistanê re dibîne û ev êrîşên dewleta Tirk li dijî hemû zagon û qanûnan e. Ev yek gelek xeterî û metirsiyan ji bo demên pêş bi xwe re tîne."



Di daxuyaniyê de komkûjiya duh li dijî sivîlên Iraqê li gundê Perex ê girêdayî Zaxoyê çêbû wekî sûcekî mirovahî hate binavkirin û berpirsiyariya wê girtin ser rayedarên Iraqê û rayedarên herêma Başûrê Kurdistanê, ji ber her li hember van êrişan bêdeng man û li hemberî wê helwesteke tûnd li dijî dewleta Tirk nîşan nedan."

Di dawiya daxuyaniyê de hate gotin: "Em rêxistina Kongra Star bang li gelê Başûrê Kurdistanê û gelê Iraqê dikin ku bargehên dewleta Tirk li welatê xwe nehêlin û xwedî helwest bin. Ji ber ku armanca dijmin eşkere ye û daxwaza wan dagirkerî û têkbirina hêz û îradeya gelan ya azadîxwaz e."

***ANF***

## Zana Kobanê: Yên êrişî me bikin wê berdêlên giran bidin

**Ji fermandarên QSD'ê Zana Kobanê got: "Heger dewleta Tirk a dagirker êrişeke berfireh a dagirkirinê li ser herêmên din ên Sûriyê pêk bîne, em ê bersiveke xurt bidin. Yên ku êrişî me bikin wê berdêlên giran bidin."**

Bi armanca ku şênî û saziyên herêmê li hemberî gefên dewleta Tirk a dagirker, di aliyên siyasî, leşkerî û aborî de tedbîran bigirin û amadekariyan bikin, Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 6'ê Tîrmehê de rewşa awarte li seranserî herêmê ragihand.

**'Bi berxwedana gel emê bi ser kevin**

Girêdayî wê mijarê, ji fermandarên QSD'ê Zana Kobanê anî ziman ku dewleta Tirk hewl dide herêmê dagir bike û got: "Êdî divê dewleta Tirk a dagirker nas bike ku eger ew êrişî herêmê bike dê ne wek êrişên wê yên li ser Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê be, ew ê bibe şerê hebûn û nebûnê û dê dawiya dagirkeriya Tirk bîne."

Zana Kobanê wiha domand: "Em niha di qonaxeke hestyar û çarenûsî re derbas dibin. Ev 10 sal in kirîza Sûriyê didome, gelê me û hêzên me rastî hemû cureyên şer tên. Dewleta Tirk a dagirker me armanc digire ji ber ku em astengiya yekane li hember planên wê yên dagirkirina Rojhilata Navîn in."

Zana Kobanê bang li gelê herêmê kir ku li derdora hêzên xwe yên parastinê kom bibin û got: "Dewleta Tirk a dagirker şerekî taybet li dijî me dimeşîne, divê gelê me vê yekê baş nas bike û li xendeqan destekê bide me."

Kobanê her wiha destnîşan kir ku dewleta Tirk a dagirker ne tenê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, heman demê li ser piraniya xaka Sûriyê xeteriyê çêdike û wiha domand: "Hêzên me yên leşkerî hêza xwe ji gel digirin. Tiştê ku em ji gelê dixwazin ew e ku eger şer çêbibe dev ji xaka xwe bernedin û di malên xwe de bimînin, ji ber ku bi mayîna wan bêguman em ê bi ser kevin."

**'Em şer naxwazin'**

Fermandarê QSD'ê Zana Kobanê peyamek ji civata navneteweyî re şand, tê de wiha anî ziman: "Divê cîhan tevde bizanibe ku 'terorîstên' ku dagirkeriya Tirk dibêje ku ew şerê wan dike, xwediyên vê xakê ne ji Kurd, Ereb, Suryan û Tirkmenan in. Tenê sûcê wan ew e ku li hember êrişên dagirkeriya Tirk li ber xwe didin û xaka xwe diparêzin û naxwazin tiştê ku hatiye serê şêniyên deverên di din dagirkeriya Tirk de, ji kuştin, revandin, dizî û komkujiyan, were serê wan jî."

Zana Kobanê wiha domand: "Em şer naxwazin lê gava gelê me û herêmên me dikevin metirsiyê wê demê em bêdeng namînin û em ê bertekên hişk bidin. Taktîkên hêzên me ji sala 2018'an



cudatir e, me perwerdeyên nû yên bikaranêna çekên pêşketê girtin û moral û îradeya me bilind in, em amade ne têkevin şerê hebûn û nebûnê."

Fermandarê QSD'ê Zana Kobanê di dawiya axaftina xwe de bang li hevkarên dagirkeriya Tirk kir ku xwe ji bo pereyan nefiroşin û destê xwe bi xwîna şêniyên herêmê nekin.

***ANHA***

# Çiyakurd: Erdogan li Tehranê encama dixwest bi dest nexist lê di êrişê de biisrar e

Bedran Çiyakurd encama civîna Tehranê nirxand û got mîna civînên Astana ti vîn û biryarên Sûrî di civîna wan de tinebûn. Erdogan jî encama dixwest bi dest nexist, lê di ya xwe de biisrar e.

**Navenda nûçeyan**

Ji bo nirxandina civîna Tehranê û pêvajoya piştî wê me hevpeyvînek bi Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Bedran ÇiyaKurd re çêkir.

Hevpeyvîn wiha ye:



**Hûn çawa encamên cîvîna Tehranê ya 19ê Tîrmehê dixwînin?**

Civîna Tehranê ku bixwe heman aliyên Civênên Astanayê ne, civîneke girîng bû. Me jî ji nêz ve ev civîn şopandin. Helwest û siyaseta Rûsya û Îranê ya li hemberî êrişa gengaz ya dewleta Tirk helwesteke erênî ye. Lê ev helwest tenê têrê nakin ku pêşî li dewleta Tirk bigirin. Erdogan bi daxuyaniyên xwe de biisrar e û dibêje “ Bê ku destûrê ji kesekî bigirim, em ê şerê rêxistinên terorîst ên li Sûriyê bikin”. Ya din jî di vê civînê de ti vîn û biryareke sûriyan tune bû, lê belê li ser Sûrî û gelên wê bazar hatin kirin.
Dixwazim hin mijaran zelal bikim, ya yekê; tu parçeyek ji Sûriyê xeterê li ser ewleyiya dewleta Tirk çênekiriye. Lê tersî wê dewleta Tirk xeterê çêdike.

Ya dinê nabe her yek li gorî xwe navê terorê bavêje ser hinekan, mîna dewleta Tirk ku têkoşîna Gelên Herêmê ya azadî û demokrasiyê bi terorest bi nav dike. Terora ku hemû cîhan û yek ji wan hêzêan QSD`ê şerê wê kir îro di hembêza dewleta Tirk de ye, bi taybet li herêmên dagîrkirî, heta serçeteyên DAIŞ’ê li nêzî baregehên dewleta Tirk tên kuştin. Ev îsbat dike ku dewleta Tirk destekê dide wan û parastina wan dike.

Li gorî şopandina me Erdogan di vê civînê de negihaşt armancên xwe, lê dîsa got ew ê bê destûra tu kesî êrişên xwe yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bidomîne.
Em bi hêvî ne ku li pişt perde û maseyan lihevkirin çênebûbûn, ji ber ku lihevkirinên veşartî wê encamên wê weke karesatekê be li Ser Sûriyê.

**Piştî civîna sêalî ya li Tehranê, Wezîrê Karê Derve yê Sûriyê çû îranê û bi wan re civiya, hûn vê çawa dirixînin?**

Gelek daxuyaniyên hikumeta Şamê yên li dijî dagirkeriya Tirk hene, ev daxuyaniyên baş in. Lê eger êriş pêk werin ev daxuyanî wê çawa bibin pratîk?. Gelo ew ê paş ve vegere yan li dijî êrişan bisekine? Peyman di navbera QSD`ê û artêşa Sûriyê de hene. Li gorî peymanê artêşa Sûriyê li ser xeta sînor belav bibin. Ev gaveke girîng e, lê eger ev gav veneguhere çareseriya siyasî wê nedome û bandoreke neynî li tevayiya sûriyan bike.
Mixabin, hê jî Wezareta Karê Derve ya Sûriyê bi daxuyaniyên xwe QSD`ê û Rêveberiya Xweser wek hêzên cihêxwaz û hevkarê derve re sûcdar dikin. JI aliyekî din ve têkilyên wê yên istxbaratî bi Tirkiyê re hene. Ev parçekirina Sûriyê bi xwe re tîne û xizmeta yekitiya gelên sûrî û çareseriya siyasî li Sûriyê nake.
Divê Rûsya û Îran zextê li Şamê bikin ku hişmendiya xwe biguhere û gavên nû ber bi çareserî û diyalogan baavêje.

**Biryar û amadekariya rewşa awarte hûn çawa dibînin?**

Pêkanîna êrişê ji liyê Tirkiyê ve her tim pêkan e û li desteka cîhanê digere. Heta niha êrişên xwe yên bi balafirên bêmirov û topan didomîne. Dibe Tirkiyê li benda tu kesî jî nemîne û êriş bike. Lê diyar e ku pirsgirêk û astengî li pêşiya wê derdikevin, ji ber vê li peymanan digere da ku van astengiyan rake. Divê Rêveberiya Xweser bi tevayiya saziyên xwe li gorî vê rewşê xwe amade bikin çi di qada ewlehî, aborî, xizmetguzarî û aborî de, çi civak, rewşenbîr û partiyên siyasî, dive tevayiya hêza xwe bixin xizmeta berxwedanê û xwe birêxistin bikin . Niha amadekarî baş in lê ne li gorî ku tê xwestin, divê hîn zêdetirî amadekarî hebin. Da ji am êrişan têk bibin û destkeftiyên şoreşa xwe biparêzin.

***Çavkanî: ANHA***

FENER

## Faşîzm di nava tayên mirinê de ye



**Idrîs HENAN**

Geşedanên vê dawiyê bi lez weke teneyên tizbiyek tayê wê qetiyabe herikîn û gelên herêm û cîhanê rûbirûyî dînekî hov ku êdî dest bi kiritîna bedena xwe kiriye, ma. Ne te dizanî pêşe de, ne jî te dizanî paş de ye! Rewş wisan di şer û bomberdomanê de maye ku her derê girtiye toz û doman. Dewleta Tirkam ya dagîrker ji Nîsanê ve, bi piştgiriyeke xort a PDK`ê, êrişên dijwar bi ser Herêmên Parastinê yên Medyayê ve diajo. Di van êrişên nemerdane de, ti cureyên çekan neman ku nehatin bikaranîn. Ji bombeavêjan bigire û heya çekên nukleerî yên taktîk. Bi dehan cureyên çekên kîmyawî û teqemeniyê li enî û tunelên şer hatin ceribandin. Her derê vediguherînên qadeke bêjiyan. Ev şer û êrişa îro ne weke her carê ye. Jixwe Fermandariya Giştî ya Hêzên Parastinê diyar kiribû ku, ne ji destek û alîkariya PDK`ê be, faşîzma Tirkî nikare ewqas dem li ber derbên Gerîlayên Azadiyê xwe ragire. Lê ji hovîtiya êrişan wêdetir, pêwîst e mirov qala berxwedana dîrokî ya bêhempa ya Gerîlayên Azadiyê bike. Berxwedana ku îro tê kirin, teqez wê li dîroka şoreşa bindestan zanisteke nûjen a berevaniyê zêde bike. Zanisteke têkneçûyî ku dikare di bin her şert û mercî de li ber xwe bide û jiyanê biafirîne.
Ji bo nixumandina van têkçûnên xwe, faşîzm demek e li pey hewldanên êrişên li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Dixwaze krîza sermayedariyê biçewisîne û dubendiya ku deh sal in zêdetir li ser benê wî dilîze, berdewam bike. Li Madrîdê bazarên Finlande û Swêdê kirin û hinek lihevkirin di çarçoveya berfirehkirina bloka NATO de, pêş xistin. Tevî ku itîfaqên li dijî têkoşîna gelan û girtina pencereya demokrasiyê bûn, lê dîsa jî li gorî dilê faşîzma Tirkî nebû. Hîcar berê xwe da koma Astana ku hevparên wî yên sûc û parçekerên axa Sûriyê ne. li Tehranê civiyan û li bendê bû lempeyek, çiqas şewq kêm be jî, jê re bê vêxistin. Ji bilî nameyên siyasî yên aliyên civînê ku ji hev re dişandin, diyar bû ku hêza ti kesî ji wan nîne biryara êrişên Tirkiyê erê bike. Ne DYE dikarîbû û ne jî Rûsya dikare bike. Hêza wan nîne. Trump, di zemanê xwe de karekî wisan kir û sala 2019’an rê ji Tirkiyê re vekir ku Serê Kaniyê û Girê Spî dagîr bike. Lê di encamê de Trump ji dest da û ji desthilatdariya Amerîka ket. Yên îro jî nikarin wê berpirsiyariyê hilgirin ku têkoşîna gelan a bakur û rojhilatê Sûriyê veguheriye têkoşîneke hevpar a tevahî gelên cîhanê. Civaka navdewletî van sûcên faşîzma Tirkî qebûl nake û kesê ku destek bide jî, hezim nake. Wê nefret bikin.
Faşîzm di nava kirîzeke cidî ya hebûn û nebûnê de ye. Li hundir di nava têkçûna aborî, siyasî û exlaqî de ye. Li derve, ji projeyên herêmî û yên navdewletî, aliyê jeopolîtîk ji dest dide. Li çirava Zap, Metîna û Avaşînê vegeviziye û êdî nikare xwe ji têkçûnê biparêze. Ne wî û ne jî şirîkê wî PDK`ê karîbûn gelên başûrê Kurdistanê aliyê xwe ve bînin û piştgiriya wan a bi êrişê re qezenc bikin. Berovajî wê, berteka gelê Kurd li Başûr zêdetir û tundtir bû. Lewre bi aqilê PDK`ê kir û berê xwe da Zaxo û bi zanebûn welatiyên Ereb kuştin ku raya giştî ya Iraqê û civaka Ereb li dijî gerîlayan bixebitîne. Lê xuya ye, ne rondikên Barzanî û rayedarên PDK`ê û ne jî daxuyaniyên panîkwar ên Tirkiyê wê vê komkujiê efû bikin. Faşîzm di nava tayên mirinê de ye û rojên xwe yên dawî dijî.

# ’Yekîtiya gelên Sûriyê têkçûna dagîrkeriya Tirkiyê ye’

**Mihemed Xanim-Qamişlo**

**Ezher Ehmed diyar kir ku ji bo têkbirina planên dagîrkeran yên li ser xaka Sûriyê, pêwîstiya tevayiya gel û hêzên welatperwer yên Sûriyê bi yekîtiyê heye û got, gel heta asteke bilind xwe ji êrişan re amade kiriye û teqez emê bi sre bikevin.**

Bi armanca şkandina vîna gelên herêmê û têkbirina projeya Neteweya Demokratîk, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê bênavber didomîne. Di nava bêdengiya cîhanê de, Erdogan û çeteyên wî gefên xwe yên ser herêmê zêde dikin û ji bo qirkirina gelên herêmê, bi hêzên navdewletî re di nava bazarê de ne. Bi zêdebûna gefên dewleta tirkî ya dagîrker, Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê rewşa awarte ragehand. Têkîldarê mijarê Rêveberê Yekîtiya Roşenbîrên Herêma Cizîrê –ofîsa Hesekê Ezher Ehmed ji me re axivî.

**’Armanca dewleta tirkî ya dagîrker qirkirina Kurdan e’**

Ezher Ehmed diyar kir ku êrişên dewleta tirkî ya dagîrker ne tiştekî nû ye, bi salan e tên kirin û wiha dewamî da axaftina xwe: “Dijminatiya dewleta tirkî li hemberî gelê Kurd dûr û dirêj e, lê bi despêkirina şoreşa Rojava re ev êriş zêde bûne. Dagîrkeriya tirkî dixwaze projeyên xwe yên dagîrkirinê di herêmên Kurdan de pêk bîne. Tirkiyê cara yekê bi riya çeteyên DAIŞ`ê êrişî Kobanê kir. Pişt re herêmên Ezaz, Bab û Cerablûsê dagîr kirin. Herwiha Efrîn, Serê Kaniyê û Girêspî jî dagîr kirin. Dagîrkerî di binê navê `parastina ewleyiya xwe` de, projeyên dagîrkirina xaka Sûriyê fireh dike.”

**’Siyaseta Erdogan li tavayiya qadan têk diçe’**

Ehmed da zanîn ku dewleta tirkî ya dagîrker ji pêkanîna êrişeke fireh ser herêmên Rêveberiya Xweser, bi dewletên cîhanê re di nava bazaran de ye û wiha got: “Tirkiye destkeftiyên gelên herêmê li ser xwe xeter dibîne. Bi destpêkirina aloziya li Sûriyê re, gelên herêmê sîstemeke demokratîk ava kirin. Gelan pêşengiya projeya Neteweya Demokratîk kir û bi awayekî serkeftî herêm bi rê ve birin. Projeya Neteweya Demokratîk bû bingehê rêxistinbûn û azadiya gelên herêmê. Dema dagîrkeriya tirkî dît ku ev projeya demokratîk pêş dikeve û wê çareseriyê bi xwe re bîne, li ser xwe xeter dît. Herî dawî Erdoxan serdana Tehranê kir û bi Rûsya û Îranê re civiya. Erdoxan ji wan xwest ku destekê ji bo êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê bigire, lê weke tê xuyakirin daxwaziya wî nehatiye qebûlkirin. Ji ber wê Tirkiyê komkojiyek li gundewarê Zaxo pêk anî û xwest peyamekê bide Îran û hêzên din ku ne bêçare ye”

**’Dagîrkeriya tirkî ji pirsgirêkên cîhanê sûdê digire’**

Ehmed da xuyakirin ku hêzên cîhanî ji bo berjewendiyên xwe beşdarî krîza Sûriyê bûn û wiha got: “Dagîrkeriya tirkî her dem hewl dide ji pirsgirêkên Rojhilata Navî û cîhanê sûdê bigire. Li ser nakokiyên navbera dewletan de dilîze û amancên xwe pêk tîne. Ji ber ku cih û erdîngariya Tirkiyê ji bo dewletên rojavayî girîng e, her kes dixwaze bi riya bazarên ser gelên herêmê aramncên xwe bi dest bixe. Dagîrkeriya tirkî li ber çavê tevayiya cîhanê komkojiyan dike û tevayiya hêzên navneteweyî xwe bêdeng dikin. Hêzên cîhanî Ji bo berjewendiyên xwe,



çi ji destê wan tê dikin. Di dîrokê de baş tê dîtin ka çawa van hêzan ji bo berjewendiyên xwe gelên azadîxwaz kirine qurban.”

**’Yekîtya gelên herêmê wê serkeftinê misoger bike’**

Rêveberê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê –ofîsa Hesekê Ezher Ehmed da zanîn ku yekîtiya gelên herêmê wê planên dagîrkeran pûç bike û axaftina xwe wiha qedand: “Di vê pêvajoyê de ya herî girîng birêxistinbûn e. Pêwîst e gelên herêmê xwe bi rêxistin bikin bikin û ji rêveberiya xwe re bibin destek. Proje û fikrê Neteweya Demokratîk, ji gelên Rojhilata Navî re xelasiya ji dagîrkerî û serdestiyê ye. Ji ber wê divê gelên herêmê li gorî wê xwe pêş bixin û nirxên hatîn bidestxistin biparêzin. Ji her demê zêdetir pêwîstiya gelên herêmê bi yekîtiyê heye. “



# `Xweparastin, berxwedan û têkoşîn encama jiyana azad e`

Li ser êrişên dewleta tirkî ya dagîrker, hunermend Beha Şêxo got, berî ku dem derbas bibe, divê hêz û partiyên kurdî helwesta xwe bikin yek.

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

Li ser gef û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker, rojnameya me bi hunermend Beha Şêxo re hevpeyvînek pêk anî.
Hevpeyvîn wiha ye:

**Ji destpêka şoreşa Rojava heta îro êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê ranewestiyane armanca wê çi ye?**

Em tev dizanin û li ber çavê cîhanê ye ku ji hezarê salan ve dewleta tirk li dijî mafê gelê Kurd e. Ji berê ve Erdoxan gotiye `Eger Kurd konekî li ser Heyvê vegirin ezê xerab bikim`. Piştî şoreşa Rojava dewleta tirkî ji bo têkbirina ewleyiya herêmê dest bi êriş û dagîrkirinî kir.

**Li hemberî êrişan tu bêdengiya dinyayê çawa dinrxînî?**

Dewletên xwedîhêz ji bo berjewendiyên xwe, çavê xwe li êrişan re digirin. Rêxistinên bi navê mafê mirovan yên li Ewropa, li welatên xwe tenê li ser mirajên mirovî radiwestin. Lê li derveyî welatên wan nerîneke wan cuda ye. Ku bi milyonan jî ji me werin kuştin ji wan re ne derd e. Li gorî berjewendiyên welatên xwe dixebitin. Ji wan re ne xem e ku li ser hesabê melê me xwe têr bikin û me birçî bihêlin. Hêzên ku niha li vê derê dimînin jî her çiqas bêjin ku emê alîkariya we bikin, şerê dewleta tirkî nakin, lewra di NATO de ye.

**Di vê qonaxê de tişta herî girîng û pêwîst çi ye?**

Diviya helwesta hêz û partiyên kurdî di civînên herêmî û dewletî de yek bûya. Em nabêjin dem derbas bûye, hê jî derfet heye ku ji bo vê bixebitin. Lewra enceq bi yekîtiyê rê li pêşiya êriş û gefan were girtin. Divê dewletên xwedîbandor jî dabeşkirina xaka Sûriyê qebul nekin. Lewra her zerara bigihe bakur û rojhilatê Sûriyê wê li Rojhilata Navî bibe sedema aloziyê.

**Çima rejima Sûriyê li hemberî van êrişan bêdeng e?**

Hêza rejima Sûriyê pir lawaz bûye. Derfetên wê nînin ku nexşeya Sûriyê tevê bi hêza xwe biparêze. Ev dihêle li heberî dagîrkirina dewleta tirkî bêdeng be. Dewletên erebî jî xwe ji pişta Sûriyê dane alî. Lê divê em ji bîr nekin, her çiqas rejima Sûriyê, Îran û dewleta tirkî li dijî hev bin jî, dema dibe behsa Kurdan, helwesta wan dibe yek. Ev jî dibe cihê gumanê ku Sûriye û Tirkiye di bin mase de li dijî Kurdan dixebitin. Lewra Sûrî dixwaze careke din bakur û rojhilatê Sûriyê bixe destê xwe.

**Eger êrişeke nû çêbe ji gel çi tê xwestin?**

Jixwe dîroka Kurdan tev komkujî û talan e. Ev salên niha salên dîrokî ne. Çalakî û berxwedana gelê Kurd dike, têkoşîna man û nemanê ye. Ji bo wê eger êrişek çêbe, wê banga me ji gel re ew be ku, dev ji xaka xwe bernedin.



Hunermend Beha Şêxo axaftina xwe wiha qedand: “Gelê Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê ji bo azadiya xaka xwe û ji bo jiyaneke birûmet bi hezarê salan e li ber xwe dide. Ti carî ne me şer nexwestiye ne jî me şerê kesekî kiriye. Lewra ti kes ji şer hes nake. Lê dema şer tê ber deriyan, helbet wê mirov li ber xwe bide û xwe biparêze. Hêviya me ew e ku ti êriş çênebin û herêmên me yên dagîrkirî rizgar bibin. Bawreriya me bi şervanên me heye, heta dawiyê jî emê li pişta wan bin û li ber xwe bidin. Lewra Kurdistanê li ber dilê me pir biha ye û hêja ye ku mirov canê xwe ji bo wê feda bike.”

# `Divê cîhan vê neheqiyê qebûl neke`

**Ronahî-Eyn Îsa**

**Welatiyên kantona Girê Spî diyar kirin ku divê gel li hemberî êriş û gefên dewleta tirkî hişyar bin. Herwiha divê gel planên dagîrkîrina xaka Sûriyê, bi têkoşîn û berxwedana xwe têk bibin.**

Dewleta tirkî ya dagîrker di demên dawî de gefên xwe yê ji bo êrişeke nû ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, zêd kirine. Bi dagîrkirina herêmên Rojava, demografiya herêmê diguherîne. Ji bo êrişeke nû bi dewletan re di nava bazarê de ye. Herwiha ji bo pêkanîna planên xwe yên qirêj, bi koçberên Sûriyê gefan li dewletan dixwe.

Ji bo hişyarkirina gel li hemberî gefên dewleta tirkî, Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, berî demekê rewşa awarte ragihand. Rêveberiyê ji gel re diyar kir ku, dewleta tirkî ya dagîrker ji bo dagîrkirina herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, xwe amade dike. Ji bo wê bang li gel kir ku, li hemberî van planan li ber xwe bidin û derfetê nedin ku careke din mîna dagîrkirina Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî çêbe.

**`Ev xaka me ye emê derfetê nedin ti kesî werê dagîr bike`**

Derbarê mijarê de rojnameya me bi welatiyên kantona Girê Spî re axivî. Welatiyan diyar kir ku ji bo êrişeke nû ya dagîrkeriyê xwe amade dikin. Welatiya bi navê Foza El-Elî got, em baş dizanin ku dewleta tirkî ya dagîrker planên herî qirêj li ser gelê Sûriyê dimeşîne, bi taybetî gelê Kurd. Foza axaftina xwe wiha domand: “Ev gene nû ne. Dixwaze bi van êriş û planan demografiya herêmê biguherîne, da Împaratoriya Osmanî careke din zindî bike. Ji bo wê banga me ji cîhanê re ew e ku, derfetê nede dewleta tirkî ku xaka me dagîr bike, em vê dibêjin, ji kuştin, revandin, koçberiya gelê Sûriyê re, êdî bes e.”

Foza di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya îrade û têkoşînê, ku dihêle gel bigihîje serketinê. Herwiha got, hicetên êrişên dewleta tirkî ti kes nema jê bawer dike. Wê dewleta faşîst bi ser nekeve. Lewra êrişê xaka me dike xaka ku mafê me ye em lê bijîn, ne xelkê biyanî.”





**`Belavkirina hişmendiya xweparastinê pêwîst û girîng e`**

Li ser heman mjarê welatiyê bi navê Xalid Dawid jî teqezî li ser girîngiya amadekarî û çalakkirina parastina civakê kir. Xalid got, ji bo gihîştina asteke bilind ya hişyariya xelkê, divê cihên peywendîdar, li ser xweparastin û rihê komînal civakê perwerde bike da gel li hemberî planên dijmin bisekinin û wan têk bibin. Di rewşên wiha de berî her tiştî divê gelê herêmê li ber xwe bide û xwe biparêze.

Xalid got, di rewşeke wiha de ku dewleta tirkî ya dagîrker li ber çavê cîhanê êrişî me dike, ya herî girîng divê were kirin, biratiya gelan e.

Xalid Dawid di dawiya axaftina xwe de bang li pêkhateyên herêmê kir ku beşdarî xebata parastina nirxan bibin. Herwiha ji gel xwest ku bi şervanên ku civakê ji dagîrkeran diparêzin (Hêzên Sûriyeya Demokratîk) re bibin alîkar. Herwiha divê gel parastina mal, gund û bajarê xwe bi berxwedan û têkoşîna xwe biparêzin da tişta li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî bûyî dubare nebe.

## Peymana Lozanê



**Farûk SAKIK**

Di encama Şerê Cîhanê yê Yekê de ku çar salan ajot de, Brîtanî û hevalbendên wan bi ser ketin û împaratoriyên mezîn yên weke Osmanî, Alman-Awistirya û Rûsya têk çûn. Li ser xaka van imparatoriyên têkçûyî dewletên nû peyda bûn.

Xaka Osmanî jî ji hev belav bûbû û ji bilî Kurdan hemû neteweyên din ji împaratoriyê veqetiyabûn. Li ser mîrata mayî jî di bin serokatiya Mustefa Kemal de komarek hatibû sazkirin.
Lê gelek pirs û pirsgirêk hîn jî didomiyan. Kurdistan di navbera Tirk, Brîtanî, Fransî û Farisan de mabû.
Mustefa Kemal li Erziromê 23’yê Tîrmeha 1919’an kongreyekê pêk tîne. Du armancên Mustefa Kemal hebûn: Hewl dida li derve piştgirîya Sovyetan û li hundir jî piştgiriya Kurdan bi dest bixe.
Berî ku herin Lozanê ji Kurdan piştgiriyeke mezin girtibûn. Peymana Lozanê dawî bû. Tirkiyê sînorên xwe yên îro bi dest xistibûn. Lê di siyaseta xwe de guhertinek çênekir. Sozên ku dabûn Kurdan di demeke kurt de ji bîr kirin.
Li Meclisê di navbera Kurdan û parlementerên din de nîqaşan dest pê kir. Ismet Înonu yê ku li Lozanê gotibû; ‘’Li Lozanê Kurdan serî li me neda. Heta me di axaftinên xwe yên Lozanê de doza xwe ya neteweyî wek ‘em Kurd û Tirk’ ango wek yek milet me parast û da qebûlkirin.’’

Di civîna girtî ya meclisê de gava Ismet paşa biryara Peymana Lozanê ya ku Mûsil ji Ingilîzan re dihişt xwend, mebûsên Kurd li dij biryarê derketin û gotin, divê Kurd ji îro pêve qedera xwe bi destê xwe diyar bikin.
Lozan ji bo Kurdan destpêka hewldana tinekirinê bû. Û di vê pêvajoyê de herî zêde bi emrê Stalîn bi her awayî şandeya Rûs bi awayekî vekirî piştgiriya Tirkan dikir. Mafên Kurdan û gelên din yên weke Ermen û Asurî-Suryanî-Keldanî bi awayekî eşkere dihatin binpêkirin. Erêkirina vê peymanê, di heman demê de erêkirina fermana qirkirinê ya gelên weke Ermen û Asurî-Suryanî-Keldaniyan bû.
Belê li Meclisa Tirkan di serî de Yusuf Beg û gelek mebûsên Kurd li dijî vê derketin û Şêx Mehmûd Berzencî jî li Silêmaniyê nerazibûn nîşan da.

Dema Peymana Lozanê dihat morkirin, li bakurê Kurdistanê jî serekên Kurdan li hev diçûn û dihatin. Di rojên Peymana bajarê Lozanê de, li bajarê Erziromê jî serek û rewşenbîrên Kurdan di nava xwe de peymanek çêkirin.

Bi wî awayî sala 1923’an Rexistina Azadî hatibû damezirandin û amadekariya serhildaneke mezin dihat kirin. Dîplomatên kubar yên bisimokîn li Lozanê bûbûn sedem ku li Kurdistanê pêvajoya serhildan û komkujiyan dest pê bike.

Piştî van serhildan û komkujiyan sala 1978’an bi navê Abdullah Ocalan rêberekî Kurdan derket qada dîrokê. Kurdan pê bawerî anî û bi rêbertî pejirandin. Kurdan bawer kir ku wê xeyalên rêxistina azadiyê, Yusuf Ziya û Xalid Beg ev kes pêk bîne.

Şerê çekdarî da destpêkirin û ew qedera Kurdan ya li Lozanê sala 1923’yan hatibû morkirin nepejirand. Ew peymana li ser xaka Kurdistanê 4 dewlet avakirî çirand.

Di pêvajoya têkoşînê de gelek destketiyên Kurdan çêbûn. Li herêma rojavayê Kurdistanê şoreş û Kurdistaneke azad çêbûn. Xweseriya demokratîk hat ragihandin.

99 sal di ser Peymana Lozanê re derbas dibin. Tirkiye ji îro ve behsa 100 saliyê û vegera sînorê xwe yê mîsakî mîllî dike. Ango Mûsil û Helebê dixwaze. Bila dewleta Tirkan ya dagîrker baş bizane ev pirsgirêka wê û dagîrkerin din e. Em Kurd jî di salvegera sedsaliya Lozanê de, Mûsil, Heleb û tevayiya herêmên Kurdan yên di binê dagîrkeriya 4 dewletan de dixwazin.